

PAPER DETAILS

TITLE: Di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê yekî bikujim û Lehiyê de Tezahurên Biyanîbûnê

AUTHORS: Mehmet Emin PURÇAK

PAGES: 11-32

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/1275189>

Di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê yekî bikujîm û Lehîyê De Tezahurên Biyanîbûnê

The Manifestations of alienation in the novels named *Ronî Mîna Evînê Tarî* *Mîna Mirinê, Ez ê yekî bikujîm* and *Lêhî*

Mehmet Emin PURÇAK*

PUXTE:

Mehmed Uzun û Firat Cewerî di romannûsiya Kurdî de xwedî kedeke mezin in. Mehmed Uzun heta mirina xwe heft roman nivîsîne. Firat Cewerî jî heta niha bi çar romanên xwe di dîroka romana Kurdî de cîhê xwe girtiye. Her du nivîskar jî ji pêvajoyê manend re derbas bûne û bandora vê jî di romanên wan de dixwûyê. Em di romanên *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê Yekî Bikujîm û Lehîyê* de serlehengêن xwedî hişmendiya netewî dibînin. Lehengêن van romanen, ji welatê xwe, ji bajarêن xwe, ji ziman û çanda xwe hez dîkin. Van lehengan di xortaniya xwe de di nava xebatên polîtik de cîh girtine û ji bo tekoşînê berxwe dane. Ji aliye derûnî û fîzîkî ve pir baş û xweş in. Di van romanen de em dibînin ku ew lehengêن xwedî kesayetek polîtik, di nava salan de fîkrîn xwe yêن polîtik û îdeolojîk diguherînin, ji welatê xwe, çand û axa xwe dûr dikevin. Naxwazin li wî welatî, li ser wê axê, di nava wan mirovan de bijîn. Ji ber vê jî dixwazin ji civaka xwe dûr bi kevin. Di vê navberê de derûniya wan jî têk diçe. Anglo di van romanen de hêmanên bîyanîbûneke polîtik, psîkolojîk û mekanî derdikevin pêş û em jî dixwazin ji van aliyan ve romanen tehlîl bikin.

Bêjeyêن Sereke: Mehmed Uzun, Firat Cewerî, biyanîbûn, mekan, psîkoloji.

ABSTRACT:

Mehmed Uzun and Firat Cewerî have great efforts in the Kurdish novel. Mehmed Uzun wrote seven novels throughout his life and Firat Cewerî took his place in the

* Dr. Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi.
Dr. Muş Alparslan University, Faculty of Arts and Sciences, The Department of Kurdish
Language and Literature, epurcak@hotmail.com, ORCID: 0000-0003-1875-5842

history of the Kurdish novel with four novels he has written so far. Both authors went through similar processes traces of which can be seen in their novels. In the novels called *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê Yekî Bikujim û Lehî*, which we will focus on, we see that the protagonists have national consciousness. They love their country, city, language and culture. The heroes took part in political works and struggled in their youth. They are physically and psychologically in good condition and handsome. In these novels, heroes who have a political identity change their political and ideological ideas over the years; they move away from their country, culture and land. They don't want to live in that country, in those lands and among those people. Therefore, they want to get away from their community. Meanwhile, their psychology deteriorates. In other words, these novels reflect political, psychological and spatial alienation, and we want to analyze them from these aspects.

Keywords: Mehmed Uzun, Fırat Cewerî, alienation, space, psychology

1. DESTPÊK

Her nivîskar ji civakekê derdikeve û problemên civaka xwe, ew jî bi civaka xwe re dijî, hîs dike û dibîne. Ji ber vê jî gelek caran berhemên xwe ji van pirsgirêkan dihûne, dirêse. Afirîneriya xwe li ser vana diceribîne. Nivîskarêni Kurd jî di berhemên xwe de li ser civaka xwe, pirsgirêk, pevçûn û şerê di nava Kurdan û yê di navbera Kurdan û dewletên desthilatdar de disekinin û vana wekî mijar û tema bi kar tînin. Em jî dixwazin di vê xebata xwe de li ser sê romanê Kurmançî (*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ezê Yekî Bikujim û Lehî*), berê xwe bidin mijarêni romanî û tevgerêni lehengê romanî. Di sê romanê me hilbijartine de pirsgirêkên civakî û ferdî di kesayetên lehengan de guherandinê neyêni pêk tinîn û ev jî bi peyva "biyanîbûnê" tê ifadekirin. Her çiqas gelek formên bîyanîbûnê hebîn jî em dixwazin di van romanî de berê xwe bidin bîyanîbûna polîtik, psîkolojîk û mekanî. Ji bona vê jî em dê berê behsa biyanîbûnê û formên wê bikin, paşê ji bo romanî metodolojiya berawerdkirinê bi kar bînin û analîzen xwe yên li ser van berheman de bikin.

2. BİYANÎBÛN

Biyanîbûnê em dikarin ji bo gelek qadêñ cuda binirxînin. Ji aliyê aboriyê, sîyasetê, dîrokê, psîkolojî û teolojiyê ve îmkana nirxandinê heye. Ji ber afirandinê em dikarin têgehê bi perspektîfa teolojiyê ve binirxînin (Tolan, 1980: 143). Temel Demirer û Sibel Özbudun ji vî aliyî ve têgehê dinirxînin. Bi ya wana, peyv di zimanê Grekan de ji peyva *alloiosiê* tê. Di zimanê Latînî de bi forma *alienatio* cîh girtiye di wateya "*xayîsbûyin, jiservîcûyin, jiserhêşçûyin*" û de hatiye bikaranîn. Di antîkîteyê de û di dema Helenîstîk de di wateya "yê yek û tek ve" ango bi "yezdan" re yekparebûn, "xwe gîhandina yezdan" de hatiye bikaranîn. Ne tenê paganîn serdemêñ antîk di heman demê di mîstîkêñ filehan û tesawûfa misilmaniyê de jî

di vê wateyê de derdikeve pêş (Demirer - Özbudun, 1998: 10). Nirxandineke din jî dibêje têgeha biyanîbûnê cara yekem li Rojava, bi pûtperestiyê ve derketiye holê (Tolan, 1980: 143). Ango mirov bi destêne xwe pûtan çêdikin û paşê wana bi sifetêne yezdaniyê ve mezin dikan yan jî em dikarin bibêjin ku bi destêne xwe yezdanêne xwe diafirînin. Ev şîrove jî rasterast qiseya Îbrahîm ya di Sûreya Enbiyayê de tîne bîra mirov. Elbet ger armanca me şîroveyeke têolojîk be, em dikarin xwe bigihînin afirandina Adem û Hawayê jî. Lewre di *Quranê* de Sureya Hîcrê de Xwedê dibêje "Sond be, Me însan (Adem) ji hişkahîyeke pehltî, ji heriyeke reşeguherî afirandiye (Ayeta 26)." û "Dema min ew tekûz kir û min ji ruhê ku mexlûqê min e puf kirê, vêca di cih de hûn jê re herin sicûdê (Ayeta 29)." Ji van ayetan ku em hereket bikin, em dikarin vê şîroveyê bikin: Yezdan, Adem bi destê xwe afirand û bi rihê xwe ew bican kir. Ew kire bihuştê û derbendek jê re danî. Lê Adem ev debend binpê kir. Bi vî avayî Adem ji yezdan û ji bihuştê re biyanî bû û ji wir hat avêtin. Em ji teoriya Darwin hereket bikin jî dîsa veguherandinek derdikeve ber me û em vê jî dikarin wekî şikleke biyanîbûnê şîrove bikin.

Ne tenê teolojî, di qada felsefeyê de jî ev problem hatiye nîqaşkirin. T. I. Oisermann di maqaleya xwe ya derbarê vê mijarê de bi perspektîfeke marksist li meseleyê dînihêre û dibêje hem di berhemên rewşenbîrên sedsala 18. -ango rewşenbîrên qirna rewşendariyê- de û di feylesofên Alman yên klasîk (bi taybet jî di Fichte, Hegel û Feuerbach) de biyanîbûn problemeke sereke bû. Bi gotina Oisermann, biyanîbûn ji aliyê çavkaniyêne xwe ve di du xalan de dikare bê dabeşkirin: 1- Têgeheke teolojîk e. 2- Hem ji xwe (laşê xwe, kokêne xwe, hwd) 'veqefîn' hem jî (bi hebûneke din ve) 'yekparebûn'ê dihewîne (Oisermann, 1974: 47-48). Lê li hember vê nirxandina Oisermann jî, Demirer û Özbudun dibêjin bi xêra serê Hegel biyanîbûn dibe problemeke felsefeyê (Demirer-Özbudun, 1998: 11). Lê veqefîna misoger bi Karl Marks dest pê dike. Ernest Mandel dibêje Marks cara yekem, dema ku li ser Hegel dixebite biyanîbûnê nas dike. Lê di destpêkê de ew li ser têkiliya ferd û dewletê disekine: "Di têkiliyêne mirova yên bi dewletê re wekî hemwelatiyekî biyanîbûna (biyanîbûna siyasî) ji bo ramanêne Marks yên siyasî, felsefî û civakî re dibe destpêk (Mandel, 1974: 50)." Li gor Mandel, Hegel dibêje hewcedariyêne mirov, wî mecbûr dikan ku hertim bixebite, lê di encama vê xebatê de tiştê ku derdikeve holê dibe tiştîkî xerîb, biyanî. Bi vî avayî jî fikrîne xwe yên biyanîbûnê dide mayîndekirin (Mandel, 1974: 52). Herwiha em dikarin bêjin Hegel biyanîbûnê wekî tiştîkî mecbûrî, tiştîkî muqedder dibîne. Lê di Marks de biyanîbûn, "tiştê ku aîdî mirov e, tiştîn ku mirov bi xwe diafirîne, di ser kirdeyan/ subjeyan re cîh digire û diyarkir dibe (Demirer-Özbudun, 19)" ye û bi vî avayî Mandel û Demirer-Özbudun biyanîbûna Marks ji aliyeñ cuda ve şîrove dikan û dibêjin Marks, biyanîbûn di demêñ cuda de cuda bi kar aniye. Di berhemên xwe yên salêñ ewil de têgeha ku wekî "biyanîbûnê" hatiye bikaranîn, di xebatêne wî

yên salên pêş de wekî “tiştbûyîn” (reification) û “fetîşîzma metayê” cîh digire (Demirer-Özbudun, 1998: 20-25). Ernest Mandel di maqaleya xwe de bi çar xalan ve li ser biyanîbûna ekonomîk jî disekine. Lê ji ber ku di romanan de ev alî zêde derneketiye pêş, em li ser vê xalê nasekinin.

Mirov zindîwereke piralî ye. Ji ber vê em wiya ne tenê bi aliyê wê yê maddî ve, ji aliyê derûnî ve jî divê bifikirin. Li der û dora me tiştên diqewimîn ji aliyê fizîkî ve bandorê li ser me dikin û tesbîtkirina van bandoran hêsanter e. Wekî mînak em dikarin guherandina cîh û war, guherandina xwezayê, guherandina cil û berg, hwd bifikirin. Mirov bi rehetî dikare guherandinê bi vî avayî bişopîne û bibîne. Lê di heman demê de ev guharandinê di gerdûna derva de diqewimin, li ser hiş û dilê me jî tesîr dikin. Em bi şiklekî vana tînin ziman yan jî hinek caran laşê me bê biryareke îradî vana nîşanî derva dide yan jî derdixe derva. Li vir civaka kapîtalîst û têkiliyê di pergala kapîtalîst de diyardeyên girîng in. Lewre kapîtalîzm hertim hewcedariyêne me zêdetir dike û ev rewş me dixe nava biyanîbûneke ekonomîk. Lê ev bîyanîbûn li vê derê nasekine û bandorê li ser têkiliyê me yên civakî û derûniya me jî dike. Mirov, li hember keda xwe, li hember mirovan û li hember xwe jî dike-ve nava biyanîbûnekê. Malê ku ew bi keda xwe diafirîne, nikare bibe xwediyê wî malî. Patronê ku bi keda wî dewlemend dibe, ji wî re biyanî ye û ji bona ku debara xwe bike, di nava lezûbezekê de mecbûre ku hertim zêdetir bixebite. Ev xebata zêde jî dibe sedem ku ew jixwe, ji malbat û civaka xwe re bibe xerîb. Wekî Marks jî li ser disekine, mirov dike wekî robotekî, wekî makîneyekî (Mandel, 1974: 60). Edî di li derva rewşeye dîstopîk hakimê jiyanê ye. Tiştên ku em diafirînin hukmê li me dikin. Ev jî bi xwe re gelek pirsgirêkîn derûnî û civakî derdixin holê. Ev rewş jî me mecbûr dike ku em guh bidin sosyolog û psîkologan.

Civaknas Emile Durkheim jî bo rewşa civakê ya ku hatiyê vê astê terîf bike, peyva anomiyê bi kar tîne. Bi anomiyê ve, biyanîbûna di nava civakê de tîne ziman û dibêje zêdebûna asta vê biyanîbûnê dê di civakê de bibe sedemê kaosekê. Vê rewşa kaotîk ya civakê jî bi anomiyê ve pênase dike (Tolan, 1980: 195) Psîkolog Erich Fromm jî li hember jiyanâ modern û civaka nûjen li ser biyanîbûna psîkolojîk disekine û dibêje, “Kesê ku tendurustiya aqilê wî baş e, afirîner û nebîyanîbûyî ye (Fromm, 1982: 299)”. Li gor Fromm biyanîbûn nexweşî ye. Nîşaneyê vê nexweşiyê jî ev in: Kesên biyanîbûyî nikarin azad tevbigerin û birtyaran bidin, bi tena serê xwe nikarin hereket bikin û hestêن xwe yên bi rastiyê winda dikin. Bi vî avayî mirovekî ku îradeya wî ji destê wî hatiye stendin, wekî robotekî tevdigere. Herbert Marcuse jî xwedî qanaatekî nêzîkî fîkrêن Fromm e. Li gor Marcus, civaka sanayiyê mirov ji rastiyê dûr dixe û mirovan dike wekî cinawirêن ku ferdan dixwin. Mirovên piralî ne, ji vê piralibûnê dûr dixin, ev mirovên yekalî jî ji îradeya xwe û ji azadiya xwe têن dûrxistin (Marcus, 1975: 292-293). Ji ber van guherandinan mirov jî xwe re, ji xwezaya xwe, ji erdnîgarî û mekanêن ku dizane, nas dike re

dibe bîyanî. Bi vî avayî biyanîbûna mekanî jî pêk tê.

Me bi kurtasî bi mînakên ji felsefe, psîkolojî û sosyolojiyê behsa bîyanîbûnê kir. Lê ev tema ne tenê di van qadan de, ji sînemayê bigire heta şano, muzîk û wêneyê di qadêن hunerê de jî bûye malzeme û derbarê vê temayê de gelek xebat derketine meydanê. Em dê di besên jêrê de li ser van sê cureyên biyanîbûnê û diyardeyên wan di romanên Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê Yekî Bikujim û Lehiyê tespit û şîrove bikin.

2. 1. Biyanîbûna Polîtîk

Peyva "polîtîk"ê di Yewnaniya kevn de ji "polis"ê tê û di wateya "bajêr, cîhê mustahkem" de ye. Peyva *politikós πολιτικός* jî di Yewnaniya kevn de di wateya "siyasî, tiştê bi dewletê ve têkildar" de tê bikaranîn. Di Frensi de ev, *politique* ango "siyasi" û "siyasetê" de tê bikaranîn.¹ Ernest Mandel jî di şîroveya xwe ya derbarê bîyanîbûnê de digot, "biyanîbûna polîtîk, wekî hemwelatiyekî biyanîbûna têkiliyên mirovan bi dewletê re" bi nav dike (Mandel, 1974: 50).

Helbet em dikarin perspektîfa vê têgehê firehtir bikin. Lewre têkiliyên siyasî tenê bi dewletê re pêk nayêن. Belê dewlet pergaleke polîtîk e. Lê di heman demê de têkiliyên mirovan bi partî û rêxistinêن siyasî re jî têkiliyên polîtîk in yan jî li hember dewletê û desthilatdariyê rexne û nirxandin jî dibe tevgerekî yan jî sekneke polîtîk. Em dê ji vî fikrî hereket bikin û di romana Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê yekî bikujim û Lehiyê de lehengan ji aliyê seknêن wan yên polîtîk ve binirxînin.

Em dikarin bibêjin her sê romanên ku em dê li ser wan bixebitin jî bi bandora jiyan û qewimînên li welat hatine nivîsîn. *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna* (1998) li welatêkî xeyalî derbas dibe. Di vî welatê mezin û fireh de herêmên cuda hene. Ji bo navenda bûyeran vebêjer li ser paytextê welatê mezin û bi gelemerpî jî li ser bûyerên li Welatê Çiyayan diseleine. Rêveberiya Welatê Çiyayan di destê desthilatdariya Welatê Mezin û di destê General Serdar de ye. General Serdar bi darbeyekê rêveberiya Welatê Mezin dixe destê xwe û bi hinceta di her parçeyê welêt de pergala xwe bide qebûlkirin, êrişan dibe ser Welatê Çiyayan û bi vê jî qirkirinêkê dide destpêkirin. Di rewşeke wiha de herkes kêm an jî zêde, di binê bandora vê tevgera leşkerî û siyasî de dimîne. Vê tevgera General Serdar dikarin em dikarin wekî biyanîbûna polîtîk binirxînin. Lewre General Serdar li hember pergala ku tê de wezîfeyê digire, bi hêza artêşa di binê fermana serokê dewletê de ye darbeyekê pêk tîne û xwe dike serokê dewletê.

Di romanê de serleheng Baz û Kevok in. Vebêjer bi van gotinan herduyan be-

1 <https://www.nisanyansozluk.com/?k=politik> (Dîroka Jêgirtinê: 07.04.20)

rawerd dike:

Serpêhatiya Baz ku ew ê, bimisogerî, tu carî pê nizanibe, weha dest pê dike. Bi mirin û xwînê, saw û tirsê, sar û sermê. Ya serpêhatiya Kevokê? Serpêhatiya Kevokê jî, em ê bibêjin, bi qasî bîst salan bi dû serpêhatiya Baz re, dîsan li Welatê Çiyan, di rojekê germ a dawiya biharê de, dest pê dike. (Uzun, 2002: 53).

Malbata Baz, di van operasyonên dagirkirina Welatê Çiyanan de, gundê xwe terk dikin û di nava newalekî de di şikeftan de xwe vedîşerîn. Lê artêşa Welatê Mezin şopa wan dibîne û wana di şikeftê de qetl dike. Li hember bombekirin û êrîşen bi çekên giran ve jî, di dawiya êrîşan de zarokêk ji vê şikeftê sax derdikeve û zabîtek jî vî zarokî dibe, dide sêwîxaneyekê û lê xwedî derdikeve û bi alîkariya wî zabîti Baz di artêşa Welatê Mezin de dibe zabîtek û armanc û wezîfeya wî ya yekem jî têkbirina serhildana li Welatê Çiyanan e. Bi operasyonên xwe yên serkeftî ve di nava artêşê de deng dide û amîren wî jî wî taltîf dikan. Piştgiriya wî dikan. Ji bona çekdarên serhildêr têk bibe hemû rê û rîbazan mubah dibîne û diceribîne. Heta ku di êrîşekê de Kevokê dîl digirin, Baz fermandarekî artêşê ye û bi vê jî serbilind e. Ji serokê dewlet û artêşê bi rîzdariyeke bêhempa hez dike. Vebêjerê romanê vê xalê bi van hevokên tîne zimên: "Lê ew nema tenê ye. Ew mensûbê ordiyeke mezin e, zabit û kumandarê hêzeke desthilat a hemû herêmê ye (Uzun, 2002: 62)."; "Êdî quweta Baz heye, aboriya wî li cih, apoletên nîşanên wî ser mil, hêz û quweta ordiyê û dewletê li pişta wî ye (Uzun, 2002: 63)." Dema Baz bi "keçika porzer" re dizewice, di şeva gerdegê de ji ber ku keçik dibêje ez di mala xwe de çek, şûr û xençeran naxwazim, Baz matmayî dimîne. Dû re ku portreya General Serdar ya li diwarê malê ye ji dîwar dadixîne. Li hember vê tevgera hevsera Baz, Baz di şeva wan ya gerdegê de li "keçika porzer" ango hevsera xwe dixe û bi giranî birîndar dike (Uzun, 2002: 94-95). Dema pev diçin, hevsera Baz bi van gotinan êrîşî Baz dike: "...ker kûrê keran, kurê bêkes û bêeslan (Uzun, 2002: 177)." Em dikarin bibêjin ev gotin, kurmê yekem e dike dilê Baz jî bo rabirdûya wî. Di beşekê din de vebêjerê romanê bi van gotinan rewşa Baz îfade dike: "Baz; leşkerekî dewlet, welat, ala û serekê dewletê; parêzger û çavnêrê disiplîn, nîzam, pergal û dûzanê; xwedî hedef û armanc, mewkî û cih. Baz; her tişt jî bo wî û dewleta wî, serek û mewkiya wî; her tişt jî bo dîsiplîn û qayideyên wî (Uzun, 2002: 268)."

Rojên ku Kevok dîl e di destê Baz de ye, Baz jî bo civîneke leskerî diçe paytextê Welatê Mezin. Baz di vê civînê de behsa Welatê Çiyanan dike dibêje, em dê li hember wan bêguman bi ser kevin, em dê wan têk bibin. Û vê pirsê dike:

Lê heta kêngî? Em ê zora wan bibin, lê em ê bikaribin baweriyeke germ bidin wan, wan bikin dostê xwe? Bêguman em ê zora çek, tiving û şerê wan bibin, lê em ê bikaribin zora stran, destanên wan ên ji bo me, nenas, bibin? Zora dengê wan stranan bibin, gotinên wan ên sirtijî, pise pisa wan a bêpayan xurt, efsane û çîrokên wan

ênen serhildanê bibin? Quweta wan a herî mezin aha ev tiştên hanê ne; zimanê wan, gotina wan, destan çîrokên wan ruhiyeta wan a -ji bo me- nediyar. Hêza wan, ne çek, şer, pevcûn û mirin e, lê ev tiştên ku ez qal dikim, in. Em ê bikaribim xwe bi van tiştan, kûrahiyên van tiştan bigihînin û zora wan bibin? Me do kuşt, em îro dikujin, lê em ê bikaribin ruhê wan ê nediyar, îsyankar, nenas ku bi bayê sibê û hinhûra şevê, tava rojê û ronahiya heyvê di nav çem, kanî, çiya, zinar, dar, daristan, gelî, newal û esmanên wan ê digere, bikujin? (Uzun, 2002: 338)

Baz van gotinên xwe di civîneke fermandarên payebilind de, li Welatê Mezin dibêje û wekî ku her kes şoke bibe, di civînê de bêdengiyek kûr çêdibe li hember van gotinên dawiya axaftina Baz. Li wê derê amîrên wî ji wî dixwazin ku Kevokê teslîmî dewletê bike. Li hember vê daxwazê Baz naxwaze Kevokê teslîm bike û amîrê wî dibêje tu li wan deran zêde westiyayî, dê emê di demeke nêzîk de terfiya te çêkin, tayîna te ji wî welatî hildin. Em dibînin ku dilê Baz vê jî qebûl nake. Naxwaze ji Welatên Çiyayan û ji hevalên xwe yên leşkeriyê dûr bikeve. Baz dema li xwe û kirinên xwe difikire vana dibêje:

Haya kê niha ji Baz heye? Kî dizana Baz kî ye, ci dike? Kî qîmetekî xuyayî dide şixul, lez û bez, fedakarî û wefakariya Baz? Ji bîst salan zêdetir e ku ew li wî aliyê jibîrbûyî yê cehenemekê, tevî mirin, kuştin, şewat û tirsê, bi şev û roj, dixebite. Wî jiyana xwe, ji bo welat, dewlet, milet, yanî ji bo van însanên ku niha dibeziñin û dilezînin, ji bo ku ev rehet bikin, bi rehetî, bêtirs bijîn, bixwin û vexwin, herimandiye.[...] Lê kî pê dizane! Encama vê fedakriyê? [...] Bi tenê navekî efsanewî yê tirs, xof, kîn û nefretê. (Uzun, 2002: 326)

Êvara wê civîna ku ji Baz Kevok xwestin, Baz diçe cem Mader ê. Mader ji wî re dibêje, te her kes, her tişt wekî amûrekî didît, armancek te tenê hebû: Xizmeta welat û General Serdar. Lê li hember van hemû xal û taybetiyê wî jî, em di beşa çardemîn de hîn dixin ku Baz diguhere. Evîn ketiye dilê wî. Mader dibêje di riya te de merhemet tunebû, tu ji xwe, ji riya xwe dûr dikevî, diguherî, ji riya xwe derdikevî; lê Baz dibêje "Na, na, ez dikevim ser riya xwe, niha, cara yekemîn (Uzun, 2002: 321)." Aîtbûna xwe ya Welatê Çiyayan jî bi van gotinan vedibêje:

"Zimanê min nagere ka ez çawan bibêjim. Ez, ewana. Ez, ji wan deran? Ez, ji wan? Hingî ev jiyana min? Ev kirin, tevger, xwîn û xwîdana ku ez dirijînim? Hemû derew? Hemû pûç? Jiyana min, emrê min, jiyan û umrekî derew û pûç? [...] Ez kî me, âidê kê me? Van hîsên kambax vê dudîlî û sûzeniya ku ez xistime, şikandime, niha jî, di vê şeva ronî de jî, bêhnê li min diçikîne. (Uzun, 2002: 345)

Bi vê biryarê ve êdî Baz ji riya xwe, ji dewlet, General Serdar û atesê qut dibe. Ji bo wî biyanîbûneke polîtîk bi vî avayî dest pê dike û dawiyê de jî ji aliyê artêşa ku ji bona wê emr û jiyana xwe xerc kiriye, bi destê hevalê xwe yên çekdar ve tê

kuştin. Erich From bi têgeha “biyanîbûna ramanî” dibêje,

Şexs, gelek caran, dibêje qey fikrek dîtiye, ev fîkr keşfa wî/ê ye û mamula wî/ê ye; lê di rastiyê de, kesayeta xwe teslîmî pûtekî yan jî serokekî ku rayagel, rojname û dewletê afirandiye, dike. Dibêje qey ev pût, fîkrêñ wî temsîl dikin, lê di rastiya xwe de, ji ber ku ev sembol wekî yezdanêñ zanîn û zanyariyê qebûl kiriyê, fîkrêñ wan jî wekî fîkrêñ xwe dipejirîne. (Fromm, 1973: 53-54)

Bi vî avayî şexs di nava rewşeke xapînok, rewşeke derew de ye. Dema ku vê fehm dike jî, ji wan fîkr, bawerî, tevger, partî yan jî xwe teslîmî çi û kê kiribe, ji wana dûr dikeve. Tiştê ku li vira Baz pêk tîne tam jî ev e. Lewre ew Baz ê ku her tiştê xwe ji bo General Serdar û artêşê dike, ji vê teslîmiyeta xwe dûr dikeve. Hêdî hêdî bereksê tiştên ku berê ji wan bawer dikir tevdigere. Di beşa çardemîn de Baz êdî wekî berê nafikire. Nikare kirinêñ xwe, kar û fîkrêñ xwe bi kesekî re parve ke. Wiha dibêje: “Herwekî ku ez jî mîna Kevokê girtî me, ketî me, windabûyî me... evçend tenê... ev çend xerîb... Xerîb? Belê, xerîb, ji bilî hin zabit û kumandaran, hin endamên ordiyê, kî dizane ka ez kî me (Uzun, 2002: 328)?” Baz di beşa panzdemîn de biryara xwe ya veqetîna ji jiyana berê dide û hestêñ xwe bi van gotinêñ vedibêje: “Êdî ne qayîde û pîvanêñ ku ez kirim dîl, ne jî tîrs û nîrê ku li ser stûyê min bû, hene, mane. Xelas. Ez azad im, rizgar im, serbest im, mîna stêrike ji van stêran, mîna heyva ku li der dibiriqe. Hew. Hewqas. Min sînor, qayide û pîlan dane ber lingan. Min di sînorêñ nexuyayî yên zahf qehîm, zahf qetî re gav kiriye. Sînorêñ ku dil û ruhê min kiribûn nav qalibekî, êdî nîn in, min ew rakirine, hil-weisandine.” (Uzun, 2002: 343) Dema Baz hîn dibe ku ji Welatê Çiyayan e, hestêñ xwe bi vî avayî vedibêje: “Hingî ev jiyana min? Ev kirin, tevger, xwîn û xwîdana ku ez dirijînim? Hemû derew? Hemû pûç? Jiyana min, umrê min, jiyana û umrekî derew û pûç (Uzun, 2002: 345)?” Bi rastiya xwe dihese: “Ez kî me? Hiç kesek, ne tiştek, bi tenê diranekî çerxeke mezin(Uzun, 2002: 347).” Ji beşa çardemîn şûn de biyanîbûna Baz gav bi gav pêş ve diçe û di dawiyê de jî, şûna ku Kevokê teslîmî artêşê bike, wê jî hildide cem xwe û ji artêşê direve. Êdî qutbûna Baz ji artêşê pêk tê û Baz ê ku nêçîrvan bû, dibe nêçir ji artêşê re û rîhevalêñ wî yên artêşê dikevin pey wî û di dawiyê de jî ji aliyê wan ve tê kuştin. Ev dewlet û artêşa ku hemû malbata wî ji holê radike, wî ji gelê wî re dike kujerekî navdar û berî nava warê kal û bavê wî dide; di dawiyê de ferманa mirina wî jî dide. Xwenasîna Baz, biyanîbûna wî jî derdixe holê. Êdî ew aîdî tu derê nîn e. Lewre hêviya xwe bi revê ve girê dide.

Baz di beşa çardemîn ya romanê de behsa mezinbûna artêşa Welatê Mezin ku li Welatê Çiyayan şer dike û behsa sixûrêñ nava refîn şervanan de, bi sedhezaran gundiyêñ “wan deran” ku çek hildane û li hember serhildêran li cem dewletê cîhê xwe girtine, bi sedan kesen ku ji nav refîn şervanan veqetiyane û aliyê dewletê

dikin, vedibêje. Ji Kevokê re jî bi van gotinan behsa kesên ku fîkr û riya xwe guherandine dike:

Mîna te bi sedan kes hene. Yanê kesên ku dev ji sewda serhildanê berdane û niha bi me re ne, bi dewletê re, ji bo dewletê dixebeitin û alfâkariya me dikin. Piraniya wan di hepisxanan de ne. Çaxa hewce be, em wan ji hepisxanan derdixin û bi xwe re dibin êrîşan. Hinêwan ên bijarte jî bi me re, lê ew, bi şev û ro, di nav şer de ne. Her roj ew dimirin û dikujin... Rewşa kesekî ne mîna te ye. (Uzun, 2002: 300)

Ev jî numûneyeke biyanîbûna politîk e, lewre ew kes fîkr, rîexistin û îdeolojiya xwe terk dikin. Li hember wê şer dikin.

Kevok ji Welatê Çiyayan e. Bavê wê parêzerekî alîgirê dewletê ye. Malbata wan jî hatiye sirgunkirin û Kevok jî li sirgûnê hatiye dînyayê. Dema zanîngehê dixwîne, ji Jîr hez dike. Ji bo ku evîndarê wê derdikeve ser çiya, ew bi pey wî dikeve, tevî nava refîn şervanan dibe. Perwerdeya politîk û çekdarî dibîne. Lê li çiyê evîndarê xwe nabîne. Şûna wê, di êrîşa yekemîn de dîl dikeve. Kevoka ku du mehan di binê îşkenceyêngiran de laş û ruhê wê hatiye birîndarkirin û pelçiqandin, ji aliyê îşkencekarê pispor ango Baz ve qaşo îfada wê tê hildan. Baz ji wê dixwaze ji tevlîbûna xwe ya nav refîn serhildêran poşmaniya xwe bilîvke û ji axaftina wî beşek bi vî avayî ye:

Li xwe mikur were, li xirabiyêngiran ku tu bûyî şirîk, li fîkrêngiran şas ku tu pê xapiyayî... Bipeyive, bibêje ku dewlet yek e, millet yek e, serek yek e, ala yek e, Xwedê yek e, bibêje ku te şâşî kiriye, bibêje ku tu ji riya rast, riya evîn, biraftî, wekhevî, xweşî, rindî, selametyê derketiyî û ketiyî ser riya şas a xirakirin, hilweşandin, perçiqandin, perçekirin, şewitandin û kuştinê, bibêje ka ew li ku ne?.. (Uzun, 2002: 262)

Lê Baz rîbazên îşkenceyêngiran cuda diceribîne û Kevokê îkna dike û Kevok agahiyêngiran cihêngiran ku lê mane dide. Ev agahiyêngiran wê dibe sedemê kuştina hevalên wî û ji ber vê bûyerê pir poşman dibe û wekî ku dev ji jiyanê berdide. Kevok dema ku bi hêviya ku hevalên wî yêngiran li serê çiyê cîhê xwe guherandibin, daxwaza Baz qebûl dike û cîhêngiran ku lê manê, nîşanî leşkeran dide. Dema ber bi şikefta dawî diçin, Kevok vana difikire: "Lê ev însan, ev şer, kîn û nefreta van însanan? Lê daxwaza vê kîn, nefret û şîdetângiran vî welaftî vegirtiye? Ev xwîna ngiran diherike? Ev dil û ruhêngiran ku bi xwînê têngiran avdan, ji xwe re xwînêngiran kaniya jînê?" (Uzun, 2002: 285) û di dawiyê de, di wî cîhêngiran nîşan dide de heft şervanêngiran hevalê Kevokê yêngiran berê têngiran kuştin. Ev ji wê re dibe derbeyeke ngiran.

Kevok ji riya xwe ya berê rûyê xwe diguherine. Îdî riya wê ya nû, nivîs e. Ji van gotinêngiran wî yêngiran di deftera xwe de dinivîse jî, em dibînin ew ji şervaniyê derbasî qadeke çawa bûye:

Ev welat min dikuje, ev însan min dikujin, ez dimirim. [...] Ez kî me? Dijmin? Xayîn? Çima ez weha bûm? Çima ez ketim vî halî? Ez li wî difikirim, li wan difikirim. Ez nizanim, ew, ewana êdî ji min hez nakin, êdî ez ne hevalê wan im, Kevoka wan im. Ez dizanim, ew, ewana, niha, ji min nefret dikin. Belê, nefret, nefreta ku bûye qedera vî welaftî, qedera me hemûyan. Baran dibare, dinya sar dibe, çiya şil dabin, berf ê bikeve erdê, lê ez hew bi wan re me. Kî me ez? Xayîn? Xayîna welat, dewlet, ala, ordî, milet, şervan, tevgera serhildanê? [...] Ez dijîm, lê xayîn, mîna xayînekê, xayîna her tişti, her kesî." (Uzun, 2002: 306-307)

Bi van gotinan Kevok rewşa xwe vedibêje. Ji van hevokan jî vebêjer biyanîbûna Kevokê bi xwendevanan re parve dike: "Kevoka ku ji gotina nefretê nefret dikir, niha ji her tişti nefret dike. Weha ye. Nefret ji van însanan, ji hemû însanan, gotinên wan, ken û henekên wan, rabûn û rûniştinên wan, fikir û gumanên wan, kîn û nefreta wan, [...]" (Uzun, 2002: 347) Lê, dibe ku herî zêde ji Baz nefret bike, lewre wî, gelek ocax kor kirine. Firsenda kuştina Baz dikeve destê Kevokê, lê Kevok wî nakuje. Em dikarin bibêjin, di navbera wî û xwe de paraleliyekê dibîne. Lewre dê bi hev re birevin û çawa Kevok xwe wekî xayîn ji heval, gel û rôexistina xwe re dibîne; dê Baz jî ji artêşê bireve, îxanetê li dewlet, artêş û General Serdar bike. Bi vî avayî biyanîbûna wan ya politîk jî temam dibe. Lewre "dema mirov binyada dewletê rexne dike ji vê biyanîbûna politîk" derdikeve holê (Kızıltan, 1986: 20).

Di romana *Ez ê Yekî Bikujim* (2008) de jî em dikarin projeksiyona xwe bîdin ser du lehengan: Temo û Dîana. Lewre roman ji çîrokên du lehengan pêk tê. Temo ji ber sedemên xebatên politîk hatiye girtin û panzdeh salan di girtîgehê de maye. Pir îşkence dîtiye û psîkolojiya wî xirab bûye. Bavê wî û birayê wî hatine kuştin û diya wî ya pîr têne maye. Piştî ku ji hepsê derdikeve, li hember guherandina civakê, Temo xemgîn dibe. Lewre dibêje ez ji bona vê civakê ketim hepsê, lê civak li min xwedî dernekeve. Temo dibêje,

"...lê armanca min ne ew e ku ez xelkê ji bindestiyê rizgar bikim. Qaşo ez demekê ji bo rizgariya miletikî rabûbûm, lê ez zanim bedelê wê ci ye. Ez behsa panzdeh salên hepsê jî nakim, lêdana sê mehan û awayê lêdanê hê jî di bîra min de ye. Şopên birînên kûr ên ku di ruh û mîjîyê min de vebûne hê winda nebûne. Gava serê min li dîwarên betonî dixist, ez gêj dibûm. [...] Ev mehek e ez hatime berdan, vî bajarî tu xwedîti li min nekiriye. Qaşo ez ji bo rizgariya vî bajarî rabûbûm. Me ê ev bajar rizgar bikira, me ê ew ji hemû xerabî û qirêjiyan pak bikira û em ê tê de weke biran bijiyyana. Ka? Qet ne xema bajêr û bajariyan nîn e. (Cewerî, 2008: 30)

Ev hest û ramanên wî hêvîşkestîna wî nîşan didin.

Di berhemên herdu romannûsan de jî em dibînin ku serleheng li hember zi-man xwedî hişmendiyekê ne. Zimanê wan li hember zimanê desthilatdar têk diçê

û ew ji ber vê rewşê jî aciz in. Kevok ji Baz re dibêje, “ji ber bîr û baweriyêن cihê, dîn û olêن cihê, ziman û huwyetêن cihê divê meriv nebe dijminê merivêن din... meriv bi huwyetek, dînek û zimanek tê dinyayê û pê dijî. Sûc û gunehê merivan di vê de çi ye (Uzun, 2002: 336)?” Kevok ku behsa van cudatiyan dike, Baz îtiraz dike û dibêje “em û ew” tune, tenê em, yek welat, yek ziman, yek netew heye li vî welatî û yên li dijî ve diaxivin xapîokê dijminê me ne. Lê heman Baz, di civîna xweya leşkerî ya dawî de dibêje em niştecîhêن Welatê Çiyayan ji aliyê çek û şer ve têk dibin, lê di aliyê ziman û çandê ve ew xwe diparêzin. Dibêje, “Quweta wan a herî mezin aha ev tiştêن hanê ne; zimanê wan, gotina wan, destan û çîrokêن wan, ruhiyeta wan e, lê ev tiştêن ku ez qalê dikim, in (Uzun, 2002: 338).” Wekî ji gotinêن Baz jî dixûyê, ziman, çand, edet û kevneşopiyêن mirovan jî aîdiyetêن nasnameyê ne û ger nasnameya we nasnameyeke politîk, sekna we sekneke politîk be, wê gavê peyvên we, ziman, çand û em dikarin bibêjin, her tiştê we, dibe tiştê polîtîk. Li hember van gotinêن Baz, wekî ku Temo biversivîne, vana dibêje: “Tu dibêjî qey ne di nava miletê xwe de me, lê min xwe li deverike din daniye. Rast e jî. Niha li bajarê min dengê zimanê min nayê guhê min. Ez di hundirê xwe de dibêjim, Xwedêyo, çawa vî milletî evqasî zû ev ziman ji bîr kir (Cewerî, 2008: 37).” Çawa di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê de bavê Kevokê ji wê re dibêje, ji bo pêşeroja xwe zimanê serdestan hîn bibe, di Ez ê yekî bikujimê de jî tespîteke nêzîkî vê heye. Temo dibêje, “Li vî bajarî, ji bilî gundî û feqîran kes bi kurdî napeyive û zimanê kurdî ji devê ‘efendiyan’ derketiye. Ên ku navê vî bajarî li xwe kirine û xwe bi navê bajêr qure dikin jî pênc peran bi zimanê vî bajarî nadin (Cewerî, 2008: 52).” Kevok ku biryara nivîsinê dide, dibêje,

Belê, ez ê binivîsim, geh bi zimanê Dadê, geh bi zimanêن din”(Uzun, 2002: 350) û nabêje bi zimanê xwe, zimanê netewa xwe; dibêje bi zimanê Dadê, ango bi zimanê diya xwe dê binivîse. Li ziman xwedî dernakeve, wekî ku tiştêkî aîdî xwe nebîne. Dema di lêpirsînê de ye, behsa destpêka dibistanê dike, bi van gotinan rewşa ziman vedibêje: “Dadê; madera zimanê zikmakî, zimanekî şérîn, zimanê lôrînê, nehwiradinê; zimanê çîrok, serpêhatî, destan, şîn, taziye, dawet, dîlan, stran û go-vandan.[...] Bi zimanê diya xwe hîn bûye, xwe nasiye. (Uzun, 2002: 275-276)

Bavê wê dibêje, “Kekova min, divê tu baş bi vî zimanî hîn bî, ji wan baştir hîn bî da ku di civatê de, di nav însanan de cihekî te, giraniyeke te çêbe.” Lewre, ev “zimanê medeniyetê” ye (Uzun, 2002: 277). Ji bo keça wî bikeve nava civaka “medenî”, bavê wê ji wê re şîretê dike ku ji aîdiyeta xwe dev berde. Ango bav, zaroka xwe ji bo bîyanîbûnê teşvîk dike. Baz jî di sêwixaneyê de ziman û çanda xwe bîra dike.

Di Ez ê yekî bikujim de serlehenga jin, ango Dîana, ji ber ku wekî şervanekê li çiya ye û dil dikeve û wê dikin karekî kirêt, bi darê zorê. Li hember dîtinêن xwe

ew jî wekî ku ji îdeolojî û ramanêن xwe yên berê vegeiyabe, poşman bûbê, van gotinan dibêje: "Erê, ez demekê ji bo rizgarkirina vî bajarî, ji bo rizgarkirina vî welaflî rabûbûm. Min ê ev bajar, xelkê vî bajarî ji hemû kirêtiyan rizgar bikira, lê ez ketim pirika bajêr (Cewerî, 2008: 110.)" Di romanê Mehmed Uzun de cerdevanî û kesên itirafkir me wekî nişaneyâ biyanîbûna politîk bi kar arîbû. Di *Ez ê yekî bikujim* de jî heman tişt heye. Lewre gundiyyê Kurd yên cerdevan Dîanayê digirin û dîbin sebebê wê (Cewerî, 2008: 135). Dema Diana di destê gundiyan de ye, bi vî avayî rewşa xwe vedibêje: "Ez êdî girtiya gundekî welêt bûm. Ez ji bo rizgariya wan li van çiyan vegeiyabûm, lê bi hêsîrî ketibûm destêwan (Cewerî, 2008: 138)." Di romanê de hem cerdevaniya gundiyan û hem jî rewşa lehenga şervan ku dîl dikeve destê cerdevanê ji netewa xwe wekî mînaka biyanîbûna politîk em dikarin şîrove bikin.

Lehî romanâ dewama *Ez ê yekî bikujimê* ye û Temo û Diana jî dîsa di vê beşe de jî behsa jiyanêن xwe dîkin. Lê bi firehî em hînî paşeroja wan dîbin û bûyerên pêşerojê jî dixwînin. Diana navê xwe dike Lehî û li Swêdê bi cîh dibe. Lê di nava pergala wê derê de çend salan ji bo ku ji xwe re jiyanekê nû çêke dilepite. Xwe ji rabirdûya xwe dûr dixe. Lê rojekî rastî mîtingeka Kurdan tê û careke din bi rabirdûya xwe re rûbirû dimîne. Pişti vê bûyerê xwe zêdetir xerîb dibîne li Swêdê û lê ye ku biryarekê bide û vegere nava rêexistinê (Cewerî, 2011: 152). Lê dê tercîha wê çi be dibe, em wê nizanîn. Her çiqas hevalê Temo, ango Nivîskar, dixwaze Temo bibe Awrûpayê bide tedawîkirin jî, Temo naxwaze. Guherandina hişmendî, civakî û derûnî, Temo dike xerîbekî. Civakê ji xwe re xetertir dibîne û dixwaze vegere hepsê. Dibêje, "Min dixwest ez ber bi girtîgehê vegeirim, vegeirim nava hevalen xwe ên dilsoz ku ji bo van mirovên nankor di hundir de ne (Cewerî, 2011: 156)." û wisa jî dike.

Di her sê romanân de jî serleheng fîkrêن xwe yên ewil diguherînin, "pûtêن xwe" terk dîkin. Tiştên ku bi wan dane tercîhkîrin û rastiya ku li dervayî vê ne didin ber xwe û xeletiyêن xwe dibînin. Ji ver vê, îdeolojî û baweriyêن wan ji wan re wekî astengiyekê dixûyêن û ew jî vana terk dîkin. Bi vî avayî di hersê romanân de jî biyanîbûneke politîk pêk tê.

2.2. Biyanîbûna Psîkolojîk

Ev cureya biyanîbûnê, ji aliyê derûniyê ve qutbûna ji rastiyê ifade dike. Mirov di nava civakekê de dijî û bandora pergala civakê li ser wî heye. Lê mirov divê xwedî kesayetekî be. Kesayet, ji taybetîyen ferdan pêk tê. Di tevger û têkiliyêن xwe yên rojane de ger ji girseyê, ji piraniya mirovan cuda be û ev cudatî jî di jiyan û têkiliyêن wî yên rojane de astengî û kêmasiyan derdixe; wê gavê li wir problemek heye (Köroğlu – Bayrak, 2010: 4). Di vir de anormalî yan jî diyardeyê nexweşiyê

dixûyê. Biyanîbûna psîkolojîk jî di vir de dikeve dewreyê. Lewre biyanîbûn, bi kurtasî, "qutbûna ji rastiyê" bû. Lê di serdemên nû de ev "rastî" gelek caran wekî pêlistoka pergala kapîtalîst e û însanan dike wekî bireserekê. Daxwazî, fîkr, hêvî û hestêن însan li gor qaîdeyêن bazarê dide organîzekirin yan ji bi kar tîne. Mirovan wekî robotan têxe binê ferman û hewcedariyên pergala xwe ya maddî. Ev jî însanan ji însanetiyê derdixe. Erich Fromm dibêje "biyanîbûn, wekî nexweşîyeke kesayetê di temelê psîko-patolojîk ya însanêñ modern de radizê."(Fromm, 1973: 57) Fritz Pappenheim jî dibêje "Însan dema ji xwe direve, ji ber ku hebûna xwe avêtiye qelpiya girseya anonîm, ji xwe dûr ketiye."(Pappenheim, 2002: 23)

Di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê de Baz xwe û hebûna xwe, kesayeta xwe aîdî dewletê û artêsa Welatê Mezin dibîne. Ne ji bona xwe, ji bo welat, dewlet û General Serdar dijî. Ji aliyê psikolojiya wî vê rewşê, radixe ber çavan. Lewre, "Faşîzm di her qadê de vê tiştê dike armanca xwe ya herî zelal: Tunekirina xwebûnê û xwe teslîmkirina hêzeke mezintir (Fromm, 1997: 215)." Tiştê ku Baz jî dike tam ev e. Lewre di mala sewîyan de bê dê û bav mezin bûya. Di mektebêñ artêşê de, bi perwerdeyeke leskerî xwe digihîne. Artêşê tenê rastiye, ango tiştê li gor xwe rast û rastî ye hîmî wî kiriye. Ji tiştêñ ku hîmî wî kirine, şik nekiriye. Di destê artêşê de dibe makîneyeke kuştinê. Li Welatê Çiyayan bîst salan zêdetir wezîfe dike. Mirin, kuştin, işkencekirin, şewitandin, bi ferman û pêşengtiya wî pêk têñ. Lê, pişti çil saliya xwe û pişti van kirinêñ xwe yên kirêt û dijmirovane, hîn dibe ku ew jî ji wan mirovêñ ewqas afat anînê serê wan, ewqas li wan zilm û zordarî kiriye, kesek e û malbata wî ji aliyê artêşê ve hatiye kuştin. Baz ji Zabîtê Simbêlqît, hîn dibe ku heta wê rojê jiyanekî derew jiyaye. Hestêñ xwe bi van gotinan vedibêje:

Zimanê min nagere ka ez çawan bibêjim. Ez, ewana. Ez, ji wan deran? Ez, ji wan? Hingî ev jiyanâ min? Ev kirin, tevger, xwîn û xwîdana ku ez dirijînim? Hemû de rew? Hemû pûç? Jiyanâ min, emrê min, jiyan û umrekî derew û pûç? [...] Ez kî me, aîdê kî me? Van hîsêñ kambax vê dudilî û sûzeniya ku ez xistime, şikandime, niha jî, di vê şeva ronî de jî, bêhnê li min diçikîne. (Uzun, 2002: 345)

Her çiqas nexwaze ji vê bawer bike jî, demekî şûnde dikeve valahîyeke mezin. Wî bi salan ev tişt kirine. Fehm dike ku kîn, nefret dibe sedem ku rastiya jiyanê, rastiya Welatê Çiyayan nebîne: "Kîn û nefret alîkarî dikin, belê alîkarî dikin ku meriv felaketan, wehşetan nebîne, nebihîse û nepeyive. [...] Daxwaza tolê, kela kîn û nefretê, yanî riya herî hêsan, riya herî baş a hînbûna jana şewat, mirin û kuştinê ye, meriv pê hînî korbûnê dibe..." (Uzun, 2002: 318)" Pişti van gotinan Baz, êdî Bazê berê nîn e. Lewre alternatifê vê riya şas jî hîn bûye. Ew jî evîn e. Di van hevokan de em sedemê biyanîbûna psîkolojîk ya Baz dibînin. Ji ber nefretê, ji rastîye qut bûye. Erich Fromm dibêje, "taybetiya herî diyar ya kesayeta biyanîbûyî, tunekirina hestêñ wî/ê yên heqîqetê ye (Fromm, 1982: 187)." Dema behsa tenduris-

tiya mirovan dike, dibêje, tenduristiya ferdan bi tenduristiya civakê ve girêdayî ye. Civakeke ku tenduristiya wê baş be, hezkirinê, azadiya xwe afirandina mirovan, azadiya kesayetan derdixe pêş û ji bo ku mirov xwe înşa bikin aliye wan dike, imkanan dide însanan. Lê civakeke nexweş, dijmintiyê û li hember hev şik û gumanê derdixe pêş. Mirovan wekî otomatan bi kar tîne (Fromm, 1982: 86-87). Em rewşa Baz û Kevokê jî bi vî avayî dikarin binirxînin. Lewre Kevok jî serî de Naxwaze bikeve nava şer, ji ber ku evîndarê wê diçe, ew jî derdikeve çiyê. Lê piştî dîl dikeve, em dibînin ku ew ji şer, kuştin û mirinê hez nake, ji edebiyatê û afirandinê, ji jiyanê hez dike. Lê welat û rewşa welat ya di binê nîre şer de ye, herduyan jî wekî hemû mirovên din, dixe nava rewşeke "nexweş". Anglo ew li gor daxwazên xwe nikarin bijîn. Baz jî û Kevok jî vê jiyanê naxwazin, lê bûyerên diqe-wimin, herduyan jî mecbûrî jiyanekê bê dilê wan dike. Çawa Kevok bê dilê xwe diçe ser çiya, Baz jî ji ber mecbûriyetê dibe makineya kuştinê. Dema ew dixwazin vê jiyanâ ne bi dilê wan e biguherînin jî tên kuştin.

Di romanen de tirs, temayeke girîng e. "Kî dê bawer bikira ku Kevok ê, ji ber tırsa kambax, ji ber daxwaza jiyanâ kambax, vê rewşa kambax qebûl bikira? (Uzun, 2002: 310)" Kevok xwe bi xwe sedemê halê xwe dipirse. Kevok diçe li Baz dinihêre. Baz di xew de ye. Difikire demança wî bigire û wî bikuje. Paşê anîna kerekî û bi kîrê kuştina Baz difikire. Lê nake. "Lê Kevok ditirse. Kevoka tırsok!.. Çima Kevok evçend ditirse? Çima jiyanâ kambax, niha, evçend şêrîn bûye? (Uzun, 2002: 311)" Li hember van pirsên Kevokê xwe ji xwe, di rûpela deftera xwe de vana dinivîse:

"ez mirime, fetisîme... xwînê ez kuştime, tırsê ez fetisandime. Xwîn, tırs, xwîn û tırs bûne qedera min... ez çi bikim? Ez perçê bûme, ez winda bûme. Jiyan vemiriye. Perçeyên jiyanâ min, di tarîtiyê de, peregende, belav bûne. Her yek li dereke. Xew nîn e, xwarin nîn e, dost, heval nîn e, kar, şixul, jiyan nîn e, rû û rûçik nîn e. Ez ê çawan bikaribim van perçan, mîna perçen cêrekî şikestî ku bûye hezar perçê û belav bûye, bidim hev? Ez bi ku de herim? Ez çi bikim? Ez dikarim çi bikim? Ev çi hal e? Her der xwîn e, her der mirin, kuştin, birîn e. Her der tırs e. Ez ditirsim. Xwîn û tırs min dikujin. Ev welat min dikuje, ev însan min dikujin. Ez dimirim..." (Uzun, 2002: 306); "ez ditirsim... Ji bilî tırsê ez bi kîrî tiştekî, tu tişfî nayêm... (Uzun, 2002: 312)

Di *Ez ê yekî bikujim* de Diana jî ditirse û ji tırsê, ji ber ku ji xwe bawer nake ku bi serê xwe dikare xwe ji lepê kesen ku bi zorê wî dîkin nava fûhşê, lewra li bennda rizgarkerekî ye. Di van herdu lehengê jin de jî kompleksa Sindirellayê heye. Lehengê di nava lepê tırsê de ye, "li kesekî yan jî li tiştekî digere ku xwebûna xwe pê girêde (Fromm, 1997: 150)." Em dikarin rewşa Kevok û Dîanayê bi vî avayî jî şirove bikin: Ji bo ku herdu jin, ji bona xwe li hember hêzeke mezin têkin ewlehiyê, li hember wan stûyê xwe ditewînin. Karen Horvey vê rewşê wekî hêmaneke endîşeyê (anksiyete) pênase dike. Li gor wê, ev kes, wiha difikirin: Ger ez stûyê xwe li hember wan bitewînim, dê canê min di ewlehiyê de be (Horney,

1995: 72). Özcan Köknel jî tirsê tişteke normal, însanî dibînî (Köknel, 1990:16). Lê em vê şîroveya Horney jî bo şervanên teslîm dibin û dikevin binê fermaña artêşê û gundiyyênu ku cerdevaniyê dipejirînin jî bi kar bînin. Hem di romana Mehmed Uzun û hem jî di yên Firat Cewerî de em vana dibînin. Lewre bi vî avayî dê neyên kuştin, ji cîh û warênu xwe neyên müşextîkirin û dê hêza dewletê wana biparêze. Bi vî avayî ewlehiya xwe temîn dikin.

Lê ne tenê Kevok, Baz jî ditirse. Bi taybet di herdu beşen dawî de, Bazê ku êdî ne nêçîrvan, lê nêçîr e, wî ditirsîne. Di cîhekî de vebêjer vî halê wî bi van gotinan tîne zimên: "Baz ku mîrê kuştinê bû, niha, bûye dîlê mirinê. Belê, Bazê ku bêtirs diçû ser mirinê, niha, piştî mirina Kevokê, ji mirinê ditirse, zahf ditirse (Uzun, 2002: 372)." Lewre ew jî li hember hebûna xwe metirsiyekê dibîne.

Lehengênu Firat Cewerî jî di vê rewşê de ne. Li welatê ku navê wê nayê dayîn de şer heye. Temo ji ber xebat û fikrîn xwe yên politîk tê girtin û panzdeh salan di girtîgehê de dimîne. Ji ber îşkenceyan derûniya wî xirab bûya. Dema ku dermanan bi kar neyne, ji rastiyê qut dibe, karakterekî şîzoîd e. Rastî û xeyalan tev li hev dike. Bê hemdê xwe, xwebixwe diaxive, kesen xeyalî dibîne. Bi mirovan re têkiliyên bi rêk û pêk nikare dayne. Lê em hîn dibin ku Temo di zaroktiya xwe de jî ji aliyê bavê xwe ve tê rencîdekîrin. Lewre nikare mirîşkekê jî serjê bike. Diya wê jî, şûna ku wî bişîne dibistanê, şandiqa boyaxê dide piştê û dişîne xebatê. Harry Guntrip dibêje "Xwebuneke zarokî ya qels, di cîhekî nemunasîp de be yan jî di cîhekî trawmatîk de pê nikaribe serî, dixwaze vegere zikê diya xwe (Guntrip, 2003: 52)." Temo jî naxwaze bi hevalê xwe re here Swêdê, dixwaze vegere girtîgehê:

Ez li derva nesitiriyame. [...] Min dixwest ez ji vê cîhana derva bi dûr bikevim.[...] tenê cihet heye ku ez dixwazim lê vejerim, ew jî girtîgeh e. Êdî girtîgeh warê min, welatê min, cihet min e. Ez di panzdeh salan de fêrî wir bûme û ji wir pê ve nikarim cihet din ji xwe re bikim war, nikarim li cihet din bisitirim; her tiş ji min re xerîb e, xav e, min diêşîne. (Cewerî, 2011: 156-157)

Girtîgeh dê wî ji hemû hêvî û xeyalşikestanan dûr bixe. Lê di girtîgehê de rewşa wî ya psîkolojîk xirabtir dibe.

Dîana jî dîsa ji ber atmosfera nefretê derdikeve serê çiyê. Lê ew jî bi dilê xwe naçe, rewşa malbatê û civakê wê mecbûr dike. Dema dîl dikeve jî tê tecawizkirin, bi darê zorê dibe qehp û ew jî wekî Kevokê nikare xwe bikuje, nikare kesen ku wê dikin rîya xirab jî ji holê rake. Di Lehîyê de li Swêdê e û jiyanekê nû ji xwe re çêdike. Lê dîsa em ji van gotinên wî fehm dikin ku nikare xwe ji bandora wan bûyeran xilas ke:

Heke bîranînên min wek siyekê nedana pey min, min dikarîbû jiyanekê pir aram, li gundekî an jî li bajarekî pir aram bidomanda, lê min nikaribû. Loma, carinan cîhan teng, bajar teng, ode teng, kirâse min ji min re teng dihat. Carina mîna ku deh kes bi

hev re destêñ xwe têxin qirika min, min bi zorê bêhna xwe digirt û berdida. Carina bêxew dimam, carina bi rojan ji nav nivînan dergediketim, carina pariyê nêñ di ber min re nedîçû, carina jî ez dibelişîm.”; “Ne tenê laşê min, ruhê min jî gemarî bûbû. Ez carina diketim serşokê, min xwe dişuşt û ha dişuşt. Min carina bi saetan bi lûfikê xwe difirkand, laşê min sor dibû, carina xwînê tê re diavêt, lê dîsa min xwe paqij hîs nedikir. Carina min digot ji bo ez paqij bibim, ez ê çermê xwe ji xwe bişeqitînim. Carina min destêñ xwe, carina jî serê xwe li dîwêr dixist da ku ez ji acizî û bêhtengiya xwe hinekî bi dûr bikevîm.”; “Min ferq kiribû ku van demêñ dawiyê ez di ber xwe de û xwe bi xwe dipeyivîm.” (Cewerî, 2011: 183-184; 152; 222).

Em dikarin bibêjin nîşaneyêñ nexweşîya Temo û Dîana/Lehîyê sempotomên kesêñ ku işkenceyêñ giran dibînin in (Tarakçioğlu, 1990: 157-158).

Şer, mirin, kuştin, dibe sedem ku lehengêñ van romanen ji aliyê derûniyê ve ji bikevin binê bîyanîbûnekê. Ew çiqas bixwazin xwe ji van bûyeran û ji bandora wan xilas bikin jî ev îmkan nakeve destê wan. Rabirdû wekî siya wan li dû wan e. Em van gotinêñ ji Deleuze û Guattari mulhem in, dikarin ji bo her çar lehengêñ romanen jî bi kar bînin: Ew di nava pêvajoyeke hilweşandinê de hatine dinyayê (Deleuze – Guattari, 1990: 14). Ü bandora vê hilweşandinê qedera çar lehengan jî diherimîne yan jî em bibêjin jiyana wan mehf dike.

2.3. Biyanîbûna Mekanî

Armanca me bi vê sernavê ew e ku em bi çavêñ lehengan, sekna lehengan ya li hember mekanan çawa diguhere, ci di van guherandinan de xwedî bandor in, vana tespit bikin. Helbet dema em dibêjin mekan, bi nêrîneke firêh em mekanen vekirî (mehele, kuçe, kolan, tax, qad, gund, çîya, deşt, daristan, bajêrok, bajêr, hwd) û mekanen girtî (jure, avahî, mal, kargeh, markêt, dairêyêñ fermî û ofisên xebatê, şikeft, hwd) qest nakin. Vana jî xwedî bandoreke cuda ne. Têkiliya wan bi psîkolojiya legengan ve heye. Lê mekan bi gelek tiştên din ve girêdayî ne. Mînak, ziman, avahî, peyker, park, xweza, hwd. û bandora vana jî li ser leheng/ an û derûniya wan heye. Bîranîn û îdeolojî jî bi mekanan ve girêdayî ye. Lefebvre dibêje, “Mekan bi hêmanen xwezayî û dîrokî ve hatiye şêwandin û çêkirin. Mekan polîfîk û îdeolojîk e. Heta devê xwe bi îdeolojiyan ve tije ye (Lefebvre, 2017: 82).” Romanen ku em dixwazin li ser wan bisekinin jî, ji ví aliyî ve derdikevin pêş. Em dikarin bibêjin di van romanen de bi alikarîya îdeolojiyan yan jî bi alîkariya bûyeren polîfîk, mekan jî têñ polîfîzekirin û bi van mekanan ve nasnameyêñ polîfîk têñ iñşakirin yan jî leheng ji van mekanen polîfîk û nasnameya wan mekanan direvin. Em dixwazin bi gelempêrî li ser mekanekî vekiri û temsîlî anglo li ser “welat” û temsîlîn wê bisekinin. Lewre mekan, ji bo nasnameya netewî girîng e. Mirov bi sînorêñ cîhêñ xwe, ‘xwe’ û ‘yên din’ ji hev cuda dikin. Wate û temsîlîn mekanan li gor temsiliyeta wan diguhere. Di romanen de jî Welatê Çiyayan,

Welatê Mezin, bajarê Temo û Dîana lê ne, girtîgeha Temo û Swêdê mekanên girîng in ji bo lêkolîna me. Lewre bandora van mekan li ser îdeolojî, derûnî û rabirdûya serlehengan heye.

Di romana Mehmed Uzun de mekanên ku em dê li ser bisekinin Welatê Çiyayan û Welatê Mezin in. Welatê Mezin, navenda hukumet û rîveberiyê ye û standartên wê jî li hember Welatê Çiyayan pir bilind in. Baz jî Kevok jî ji welatê Çiyayan e. Lê li Welatê mezin tênu kuştin. Di sahneya kuştina wan de paytextê welatê mezin bi tasvîrên romantîk tê tasvîrkirin: "Kevok, li derveyî paytextê Welatê Mezin, li erdekî vala, li kîleka çemê bajêr, di bin ronahiya stêr û heyvê de, bi sê berikan, hate kuştin (Uzun, 2002: 371)." Lê Welatê Çiyayan bi gelemperî bi sifatên neyêni derdikeve pêş û ev jî ji ber bûyerên tênu serê lehengan e. Bi çavê Baz Welatê Çiyayan "welatê lanetkirî (Uzun, 2002: 293).", "welatê terr.. (Uzun, 2002:297)" e; "Bêhna xwînê ji wir tê, xwînê ew welat vegirtiye, şîdetê ew welat hîpnotîze kiriye. Rindî û xirabî, başî û kirêfî ketine nav hev, tu pîvan nemane (Uzun, 2002: 318)." Kevok jî piştê perwerdeyê ku derbasî axa Welatê Çiyayan dibe, bi van gotinan dîmena li pêşîya wê ye tasvîr dike:

Kevok dibîne. Rastiya ku wan behs dikir, rastiya vî welatê mirinê li ber çavê wê ye. Darêñ kevnare, mezin şewitî ne! Guleyên topêñ hawanê di gewdeyêñ wan de teciqiyane. Dañen abadîñ hilweşiyane. Şopêñ çekêñ law, topêñ hawanê, mitralyozenê mirinê, li her derî dixuyin. Heta li ser kevir, qûç, zinar û latan! Heta kevir, kuç, zinar û lat jî şewitî ne, reş bûne! Li erdê bi navê hêşinahiyê tu tiştek nemaye, her tiş, her der şewitiye. Mîna komirê, her der reş e. Her der hilweşiyayî, terkkirî ye. Dar, devî, çand bi gulokêñ êgir şewitî dinya tenha, aram. Ne kesek, ne teyrek. Însan nîn in, tevgera însanan nîn e, hez nîn e, sewda nîn e. Her der, her tiş mirî. Bi tenê şopêñ kînê, şopêñ nefretê hene. Û qîrîn. Û gazîn. Û qîrîn û gazîna bêdeng ya tebiyeta ku bi reşahiya şewatê reşa xwe girêdaye. Reşahî. Reşahiyeñ ku bi destê însanan hatiye pê. (Uzun, 2002: 239)

Nivîskarê ku Kevok pê re diaxive û jê alîkariyê dixwaze, bi gelemperî ji Welatê Mezin re dibêje, "welatê tirs û xoftijî (Uzun, 2002: 355)", "wî welatê mirin û kuştinê (Uzun, 2002: 372)". Mader ji bo Welatê Çiyayan dibêje "welatê bêgav û bêçareyan, welatê zehmetî, nexweşî û dijwariyan e (Uzun, 2002: 322)." Li cîhekî din jî bi van gotinan vebêjer behsa Welatê Çiyayan dike: "Li cihê herî dûr ê cihan, însan û însaniyetê (Uzun, 2002: 234)." Di van çend mînakân de jî diyar e ku di romanê de bi nêrîneke neyêni navê Welatê Çiyayan derbas dibe. Lê em ji bîr nekin ku ew welat ji aliyê dagirkiran ve hatiye kavilkirin; gund hatine şewitandin, gundî hatine kuştin, xweza bi bombekirinê giran ve hatine hatine şewitandin. Ger ew der bûbe dojeh, musebîb desthilatdariya Welatê Mezin e.

Li hember vê "dojeh"ê, ew cîhê ku Baz û Kevok xwe lê vedîşêrin bi van hevokan hatiye dayîn: "Baz û Kevok, li deverên ronahiyê, di nav ronahiyê de (Uzun,

2002: 353)." Wekî bihuşte tê tasvîrkirin.

Ji bo Baz welat, artêş û General Seradar pîroz in û her perçê axa welat jî yet e. Lê li Welatê Çiyayan hinek serhildêrên ku ji aliyê dujminên welêt ve hatine xapandin, li Welatê Çiyayan tengasiyê û cudatiyê derdixin. Ev der ji bona wî qada nêçîrê ye. Dema ku fermandarê wî dibêje tu dê terfî bikî û em dixwazin tayîna te ji Welatê Çiyayan hildin cihekî din, Baz vê naxwaze qebûl bike. Dema rabirdûya xwe hîn dibe û naxwaze Kevokê teslîmî artêşê bike, biryara revê dide. Kevok jî Welatê Çiyayan wekî welatê xwe, axa xwe dibîne. Ji ber ku evîndarê wê diçe, ew jî diçe nava şer. Kevok ji Jîr re dibêje, "mere wî welatê bêyom (Uzun, 2002: 280)." Lê piştî dîlketin û mirina hevalên wî, Welatê Çiyayan dişibîne dojehê. "Nefret, ji vî welatî, ji wî welatî[...]" (Uzun, 2002: 347)."Di beşa dawî ya romanê de jî Baz ji Welatê Çiyayan re dibêje, "welatê mirinê (Uzun, 2002: 374)."

Wekî romana Mehmed Uzun, di romanên Firat Cewerî de jî navê welêt derbas nabe, navê bajarê ku Temo û Dîana lê de ne, nayê gotin. Lê ji aliyê fizîkî ve mezinbûn û ji aliyê polîtîk ve jî girîngbûna wê Amedê tîne bîra mirov. Di heman demê de, ew çalakiya edebiyatê ya ku nivîskarê hevalê Temo tev lê dibe, mîvanên wekî Celîlê Celîl û Mistefa Îzedîn Resûl tev lê dîbin jî li Amedê pêk tê.²

Di Ez ê yekî bikujim de Temo, panzdeh salan di girtîgeha bajarê ku di xortaniya xwe de dixwestin rizgar bikin û jiyanke biratî însa bikin de dimîne. Dema ji hepsê dertê, dibêje li vî bajarî kes li min xwedî dernakeve. Ji aliyê polîtîk, exlaqî û hismendî ve bajêr guheriye û ev veguherîn jî li gor Temo, veguherîneke neyêni ye. Ji ber vê derheqê bajêr de van gotinan dibêje:

Min bikaribûya bajar bikuşta, digel ku heta niha min gêrikek jî neêşandiye, min ê texsîr nekira. Ez zanim ew bi kêra min nayê kuştin, nikarim agirekî jî pêxim. Lê Neron ew mîrxasî kir, agir bi zirecêba Romayê xist, diya xwe jî kuş, bû dîrok. Ez ê nikaribim wê mîrxasiyê bikim, nabim dîrok, naxwazim jî. Ez ne mîna Neron birçiyê desthilatdariyê me, rebenek im. (Cewerî, 2008: 31-32)

Elbet dema em behsa guherandinê dikin, ne tenê guherandinên razber, guherandinên şenber jî zêdene. Temo van guherandinan jî bi vî avayî tîne zimên: "Lê bajêr nas nakim, bajar ne wek bajarê berê yê, şeniyêne wê guherîne. Lixwekirina wan hatiye guhertin, avahî ne wek berê ne. Berî panzdeh salan, ne mirov wilo bûn, ne jî avahî. Reng û rûçikê her tişti hatiye guhertin. Jixwe gava niha hebekî radiwestim û li avahiya li hember dinihêrim, ez wê jî qet nas nakim. Tu dibêjî qey ev ne bajarê min, lê dîmenên filman in (Cewerî, 2008: 46)." Di beşeke dinê de jî behsa guherandinên bajêr dike û dibêje, navê bajêr jî guherandine, hinek kesan jî navê bajarê kevn, wekî nîşaneyî mîrxasiyê li xwe kirine. Vê rewşê rexne dike. Lewre

2 <http://arsiv.ntv.com.tr/news/297981.asp> (Dîroka Jêgirtinê: 10.04.20)

yên viya dikan, xwe di binê siya bajêr de bi qîmet dikan, bi gotina Temo (Cewerî, 2008: 31). Di *Lehiyê* de jî em dibînin ku Temo naxwaze here Awrûpayê, dixwaze vegere nava hevalên xwe yên girfîgehê. Lewre ew bajarê ku di dil û serê xwe de şenber kiriye, dibîne ku li holê nîn e (Cewerî, 2011: 156-157). Ew bajêr ji bo *Lehiyê* jî wekî dojehê ye. Ji xwe ew jî lavayî Nivîskar (Alan) dike, dibêje min ji vê dojehê derxe. Lê *Lehiyâ* li Awrûpayê çend salan derbas dike jî xerîbî û biyanîbûna xwe tam ji ser xwe nikare bavêje. Lewre di nava dubendiyê de ye, gelo here Almanyayê diya xwe bibîne, yan jî careke din vegere ciyê.

Alâattin Karaca dibêje di mekanan de ruh û çanda kirde, şewq dide. Mekan perçeyeke girîng ya bîra mirov e. Mekan hemaneke girîng e ku mirov bi demê ve, bi dîrokê ve, bi çandekê û bi nasnameyekê ve girê dide (Karaca, 2010: 389). Lê di romanen de leheng ji wan mekanan dixwazin birevin. Di navbera wan û mekan de qutbûnek heye û ev jî dibe biyanîbûneke mekanî.

3. ENCAM

Di sê romanen ku em li ser wan xebitîn de em dibînin ku bi taybet kesen ku em dikarin bibêjin rewşenbîr in, di nava xetereyan de ne. Xwestek û xebatêr serlehengên romanen têk diçin. Ji ber vê jî hem ji aliyên fizîkî û hem jî ji aliyên derûnî ve birindar in. Lewre xebatêr wan hêzên dewletan ditirsînin û çavêr wan hêzan hertim li ser van kesan e. Ji ber xebatêr xwe tên binçevkirin, girtin û kuştin. Bûyêren bi vî avayî jî dibe sedem ku yên ji ber van xebatan nehatine binçavkirin, girtin û kuştin; ditirsin ku dê encama wan jî bi vî avayî be. Ev jî dabin sedem ku mirov ji xebatêr xwe vekişin, ji rêxistin û tevgerên ku tê de faaliyetan dimeşînin dûr kevin. Mirov ji aliyê polîtîk, çandî, mekanî, olî, aborî û psîkolojiyê ve ji xwe, ji civak û cimaetên xwe re biyanî bin.

Di romanen de Temo, Dîana/Lêhî, Baz, Kevok wekî serleheng derdikevin pêş me. Her çar jî karakterên polîtîk in û ji bona netew, çand û gelê xwe di nava liv û tevgeran de cîh girtine û têk çûne. Temo hatiye girtin û ji ber sê mehan di binê işkenceyan de maye, derûniya wî xirab bûye. Dîana/Lêhî û Kevok perwerdeyeke polîtîk û çekdarî dibînin û derdikevin ser ciyê û wek şervan dîl dikevin destê dewletan û ji ber kirinên kirêt tînin serê wan, em dikarin bibêjin derûniya wan jî birîndar e. Baz, wekî amrazê mirin û kuştinê di nava artêşê de hatiye wezîfedarkirin. Lê di dawiya salên xwe yên di van karan de, hîn dibe ku ew jî ji wan kesen ku wî û artêşa wî qir li wana aniye, ye. Ew jî di dawiyê de ji artêşê direve. Ev hemû kes, ji aliyê derûniyê xwe ve birîndar in. Ji welat û axa xwe re, ji netew û gelên xwe re, ji civakên xwe re û ji rêxistin, tevger, partîyen xwe re biyanî ne. Ji wan vediqetin, dûr dikevin û îdeolojî û fîkrîn xwe yên berê poşman in. Paş de gav diavêjin û ev jî wana dikê bîyanî. Bi vî avayî romannûsan bi van romanen biyanîbûna polîtîk,

psîkolojîk û mekanî anîne ziman. Di romanen de ev ruhêن birîndar ji xwe re star- gehan digerin, lê wekî gotina Edward Said, ew carekî bûne bîyanî, mişextî. Êdî çi bikin jî, ew dê heta hetayî bêcîh û bêwar bin, ango biyanî bin.

4. ÇAVKANÎ

- Cewerî, F. (2011). *Lehî*. Stenbol: Nûdem.
- Cewerî, F. (2008). *Ez ê yekî bikujim*. Stenbol: Avesta.
- Deleuze, G. ve Guattari, F. (1990). *Kapitaliz ve Şizofreni -1: Göçebibilimi İncelemesi*. Ali Akay (Çev.). İstanbul: Bağlam.
- Demirer, T. ve Özbudun, S. (1998). *Yabancılaşma*. Ankara: Öteki.
- Fromm, E. (1973). *Çağımızın Özgürlük Sorunu*, Bozkurt Güvenç (Çev.). Ankara: Özgür İnsan.
- Fromm, E. (1997). *Özgürlük Korkusu*. Roza Hakmen (Çev.). İstanbul: Güloğlu.
- Fromm, E. (1982). *Sağlıklı Toplum*. Yurdanur Salman-Zeynep Tanrisever (Çev.). İstanbul: Payel.
- Guntrip, H. (2003). *Şizoid Görüngü – Nesne İlişkileri ve Kendilik*. İstanbul: Metis.
- Horney, K (1995). *Çağımızın Nevrotik Kişiliği*. Selçuk Budak (Çev.). Ankara: Öteki.
- Karaca, A. (2010). Lâkin Vatandan Ayrılışın Izdirabı Zor. Hasan Akay – M. Fatih Aydin (Haz.). *Kırk Bir Dize Kırk Bir Yorum*. İstanbul: Hat.
- Kızıltan, G. S. (1986). *Kişinin Silinen Yüzü – Çağımızda Yabancılaşma Sorunu*. İstanbul: Metis.
- Köknel, Ö. (1990). *Korkular Takıntılar Saplantılar*. İstanbul: Altinkitaplar.
- Köroğlu, E. ve Bayraktar, S. (2010). *Kişilik Bozuklukları*. Ankara: HYB.
- Lefebvre, H. (2017). *Mekânın Üretimi*. Işık Ergüden (Çev.). İstanbul: Sel.
- Mandel, E. (1974). Marksist Yabancılaşma Teorisi. Ahmet Muhittin (Çev.). *Yeni Adımlar-Aylık Sanat ve Siyaset Dergisi*, S.14.
- Marcuse, H. (1975). *Tek Boyutlu İnsan*. Afşar Timuçin ve Teoman Tunçdoğan (Çev.). İstanbul: May.
- Oisermann, T.I. (1974). Marksist Düşüncenin Problemleri-İnsan ve Yabancılaşması. Uluğ Nutku (Çev.). *Türkiye Defteri*, S.9, s.47.
- Pappenheim, F. (2002). *Modern İnsanın Yabancılaşması*. Salih Ak (Çev.). Ankara: Phoenix.
- Tarakçıoğlu, Dr. B. (1990). *İşkence Olayı-Yolaçtığı Bedensel ve Ruhsal Rahatsızlıklar, Tedavi ve Rehabilitasyon*. İstanbul: Belge.
- Tolan, B. (1980). *Çağdaş Toplumun Bunalımı-Anomi ve Yabancılaşma*. Ankara: Anka- ra İktisadî ve Ticârî İlimler Akademisi.
- Uzun, M. (2002). *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*. Stenbol: Avesta.

Extended Abstract

Modern Kurdish literature begins with poetry at the end of the nineteenth century. The first Kurdish novel was published in 1935. However, the literature was interrupted for the wars, political conflicts and conflicts in the Kurdistan geography. Kurdish in Turkey's officially banned until the 1990s due to the work of the authors give in exile. The number of novelists in the Kurmanji dialect has increased after the 1990s. We would like to emphasize the names of Mehmed Uzun and Firat Cewerî among the Kurdish writers. Mehmed Uzun and Firat Cewerî have great efforts in the Kurdish novel. Mehmed Uzun wrote seven novels throughout his life and Firat Cewerî took his place in the history of the Kurdish novel with four novels he has written so far. Both authors went through similar processes traces of which can be seen in their novels. In the novels called *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Ez ê Yekî Bikujim û Lehî*, which we will focus on, we see that the protagonists have national consciousness. They love their country, city, language and culture. The heroes took part in political works and struggled in their youth. They are physically and psychologically in good condition and handsome. In these novels, heroes who have a political identity change their political and ideological ideas over the years; they move away from their country, culture and land. They don't want to live in that country, in those lands and among those people. Therefore, they want to get away from their community. Meanwhile, their psychology deteriorates. In other words, these novels reflect political, psychological and spatial alienation, and we want to analyze them from these aspects.

Thematically, we have stated that three types of alienation stand out in these novels: spatial, political and psychological alienation. We will first look at spatial alienation. Space is important in the novels of Mehmed Uzun and Firat Cewerî. Because it represents an affiliate. Heroes love and work for these places in the chronological flow of events. What is meant here is the places where the heroes were born, raised and lived. But when events unfold in a way that they don't want, your heroes begin to hate space. So they become alienated from the place. For example; Baz, who is the hero of Mehmed Uzun, is happy to live in the country of "General Serdar". He is used to living in the Land of the Mountains. But he knows that there is a stranger there. When he learns that he is actually there, he cannot accept it. Kevok fights for the Land of the Mountains, his ancestral homeland. But after being captured, he likens the geography to hell and wants to escape and leave. Do not want to live in the city where they fight for both Temo and Dîana / Lehî in Ezê yekî Bikujim and Lehî. Temo goes to prison. Dîana / Lehî goes to Sweden. Another type of alienation associated with spatial alienation in heroes is political alienation. The heroes in the novels that are the subject of our study engage in political and military activities. But their bitter experiences also distract them from the political ideas they defend to death. They move away from the group, party or formation they are a member of. They begin to question, even criticize, the thoughts they previously defended. Thus, political alienation takes place.

As the third type of alienation, we will refer to the type of psychological alienation. By psychological alienation, we mean that the heroes become psychologically ill. In both *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* and *Ezê yekî bikujim* and *Lehî*, the negativities experienced negatively affect the psychology of the heroes. For example, in Mehmed Uzun's novel, Baz

has problems with his wife and cannot establish successful relationships with the people around him. He prefers to judge the other person instead of evaluating his own actions. Kevok suffers severe mental and psychological torture. Dîana / Lehî, the hero of Firat Cewerî, was tortured. They make him prostitute by force. He tries to kill himself. He thinks someone else can save him. Temo receives psychological treatment for the severe torture he suffered. He uses medicine for his psychology. Lehi goes to Sweden, but cannot establish a new life for herself there. Temo finds salvation returning to prison, while Lehî plans to join the organization again. Therefore, we can say that both authors depict the spatial, political and psychological alienation they see in their societies in their novels.